

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Hejmar: 40



**HÊJE MÊJE  
EMÊ NUHA ÇEND  
ÇÎROK Û MESELÊN XWE  
JI WE RE BÊJIN**

**Kuîlk**

**Sal: 1990**

## Xwendevanên Hêja,

Ew bû demek dirêj, ku em ji xwendevanên xwe yên hêja dûr manin. Ev dûrmayina, ji hinek sedemên me yên taybetî dihat. Em hêvîdarin, ku xwendevanên me ewê li me bibû-hirin.

Me gelek name ji xwendevanên xwe girtin û çavên wan li riya Kulîlkên nuh in. Em zor sipas dikin ji wan hevalên kû name, çîrok û helbestên xweş û heja ji me re şandinin. Ji ber çîh, me nikarîbû wan namenana biweşandana. Lê ew çîrok û helbestên ku gihîştinî destê me, ewê di hejmarên Kulîlkê de bê weşandin.







Me di vê hejmarê de, giraniya xwe da ser hinek tiştên ku rojane dikane bê bikaranîn. Ew tişt, daxwaziya gelek xwendevanên me jî bû.







Wek hun jî dizanin, ku dijminên welatê me, li gel zilm û zor-darîyên ne însanî, zimanê me jî qedexe kirin û nahêlin em bi vî zimanê xwe yê xweş binivîsin. Zarok û ciwanên kurdan bi awakî têr ne xwedî pirtûk û kovarê xwe nin. Di roja îro de, li tevayê dinê hew kovarek zarokên kurda heye, ku bi kurdî û tîpên latînî tê weşandin. Loma, em dizanin barekî taybetî li ser milê Kulîlkê ye. Em jî qasî îmkan û zanebûna xwe û bi alîkariya xwendevanan dixwazin vê Kulîlka zarokên kurda bide jiyandin. Em bawer dikin, ku bi rexne, pêşneyar û alîkariyên we yên giranbiha av li ser Kulîlkê namiçiq e û Kulîlk ewê ne çilmis e.








Bi hêvîya Kulîlkên bi bîhn û rengîn ve, bimînin di xweşiyê de.







**KULÎLK**




# ALFABEYA KURDÎ




TÎPÊN MEZIN	TÎPÊN PIÇÛK	WÊNE
A	a	 AL
B	b	 BEQ
C	c	 COT
Ç	ç	 ÇAV
D	d	 DEV
E	e	 ENÎ

TÎPÊN MEZIN	TÎPÊN PIÇÛK	WÊNE
Ê	ê	 ÊZING
F	f	 FIND
G	g	 GUL
H	h	 HESK
I	i	 INCAS
Î	î	 ÎSOT

J	j	 JIN
K	k	 KER
L	l	 LÊV
M	m	 MÊR
N	n	 NAN
O	o	 ORDEK
Q	q	 QAZ

P	p	 PÎVAZ
R	r	 ROVÎ
S	s	 SÊV
Ş	ş	 ŞÊR
T	t	 TIFING
U	u	 KURÊ ↑ GULÇÎNÊ ↑

Û	û	 ÛR
V	v	 VIZIK
W	w	 WERÎS

X	x	 XANÎ
Y	y	 YEK
Z	z	 ZAROK

# BERNAVÊN KESÎN

<u>BI SWÊDÎ</u>	<u>BI ELMANÎ</u>	<u>BI ÎNGÎLİZÎ</u>	
PERSONALPRONOMEN	PERSONALPRONOMEN	PERSONAL PRONOUNS	
<u>BI KURDÎ</u>	<u>BI SÊDÎ</u>	<u>BI ÎNGÎLİZÎ</u>	
Ez (min)	JAG	ICH	I
Tu (te)	DU	DU	YOU
Ew (wî)	HAN	ER	HE
		SIE	SHE
Ew (wê)	HON	ES	IT
Em (me)	VI	WIR	WE
Hun(we)	NI	IHR	YOU
Ew (wan)	DE	SIE	THEY

Nabe ku di şûna -min- de (mi), di şûna -te û tu- de (ti), di şûna -hun- de (hon) û (win) û (hûn), di şûna -ew- de (ewan) û (ewana) û (ewa), di şûna -wan- de (ewan) û (wana) û (wa) û (wanan), di şûna -wî- de (ewî) û (wîna) û (ewîna), di şûna -wê- de (ewê) û (wêna) û (ewêna) bên nivîsandin.

Ev bernavên kesîn yê han, bêtir di zimanê axaftinê de tên bi kar anîn. Lê ne li gor zimanê xwendin û nivisandinê ne. Wek tê-te zanîn jî, zimanê axaftinê ji yê xwendin û nivisandinê gelekî cihê ye.



# HEVALTIYA KERAN

Serhan bi berbanga sibê re rabû, werqîlên êzinga li ser keran jidand û berê xwe da çiyê. Di demek kurt de sê bar êzing jêkir û ket riya bajêr.

Kerekî wî xurt bû, ço ne digîhand xwe û her di pêşiyê de diçû. Kerê din tev ne wek yê pêşî bû, lê ew jî bargiraniyek mezin ji xwedyê xwe re dervedixist. Lê kerê sisya kezeba Serhan reş dikir û her sed dused gavî diçû, diket xwarê. Heta Serhan barê wî rast dikir û bi serê xwe ew radikir ser lîngan, bişta wî diket ber wî.

Serhan di dilê xwe de her nîfir dikir û ahd kir, ku kerekî baş ji xwe re bikire. Lewra ku aborîya Serhan li ser firotina êzinga bû û ev tişta her car dihat serê wî.

Serhan gihaşt bajêr, êzingê xwe firot û berê xwe da xana ku her gav diçûyê. Silav û halxweşî li xwedyê xanê da, her sê kerên xwe bi

singên xanê girêda û ber bi çarşiya canbaza çû. Serhan li nav kerên kû li mazatê bû geriya û yek ji nav wan ket serê wî. Kerekî wek bergîrekî bû. Rewşa wî baş xuya dikir. Ji ber ku, ji kerê xwe gelek tirsîya bû, bazara xwe bi xwediye kerê re kir û got:

-Heyran, ez li kerekî baş digirim. Ez her roj êzinga tînim bajêr. Rewşa kerê te baş xwanê dike, lê dîsa jî dixwazim bazara xwe baş bikim. Eger kerê te qelp û zexel be, ezê pajde vegeînîm.

Xwediye kerê bê ku li ser bifikire, bi carekê bersîva wî da:


-Bi yezdanê jor, tu kerekî wiha xurt zor dibîne. Heta sibê ji te re mohlet.

Di dilê xwe de jî got: " Ma tê çilo bizanibe, ku kerê min zexel e. Êzing tune tu niha lêkê û pêbihise, ku kerê min ne wek qilafetê xwe ye. Ji xwe, heta tu sibê dîsa were bajêr, tê min li vir nebîne."

Serhan bê ku dirêj bike jê re got:

-Heyran, ne pêwîste tu heta sibê mohletê bide min, ez bîhnek din tîm, eger ku kerê te qelp be.

Serhan kerê xwe ajot ber bi xanê û demek dirêj derbas ne bû pajde wegeriya mazatê.



**Xwedyê kerê hîn li wê derê bû û li benda ku kerên xwe yên din bifroşe. Serhan hat cem wî û jê re got:**

**-Birako, kanî perekên min û ji te re kerê te ! Kerê te him zexel e û him mexel e.**

**Xwedyê kerê bîhna xwe teng kir û got:**

**-Ez kerê xwe pajde wenagerînim. Kerê min kerekî xurt e û wek qantirekî ye. Ma tu bi çi awayî vî tiştî dikane ji bo kerê min bêje?**

**-Heyran ne pêwîste, ku em serê hevdû biêşîne. Kerê te, ne gorî ku tu pesnê wî dide. Kanî perekên min bê kû derdor dengen me bibhîzin.**

**Xwedyê kerê bewerî anî, ku ew ji destê Serhan nafilite. Lê di dilê wî de jî bûbû kul, ku bê bi çi awayî Sehan pêderxist, ku kerê wî qelp û zexel e. Loma ji Serhan pirsî:**

**-Baş e. Ezê perên te bidim, lê bi şertekî. Di bê tu ji min re bêje, ku te çawa pêderxist, ku kerê min zexel û mexel e.**

**Serhan di bin simêla keniya û persîva sewala wî da:**

**-Eger ew be, ew hêsan e. Sê kerên min hene û niha li xanê ne. Yek ji wan ço naghîne xwe. Yek jî tev ne wek wî ye, le ne pir xerab e. Lê kerê sisya him zexel e û him mexel e. Her ga-**

**va ku ez wî tînim bajêr, kezeba min pê re reş dibe.**

**Gava min kerê te bir xanê, pêşî kerê te û yê min yê herî baş hevdû bîhn kirin. Demek dirêj derbas ne bû, paşiya xwe dan hev û bi zîtoka hatin hev. Dûre, ew û kerê min yê duyem hevdû bîhn kirin. Wan jî li hevdû nekirin û paşiya xwe dan hev. Lê gava dor hat ser kerê sêyem, yê ku him zexel û him mexele, te digot kû ew destbirakê hevdû yên eskeriyên in. We gavê min naskir, ku kerê te ji sefê kerê min yê zexel e.**

**Serhan perên xwe pajde girt, xatir ji xwediyê kerê xwast û berê xwe da xanê...**

**Berevkar: Bavê Hêvî**

## DEMÊN SALÊ

Di salê de çar **dem** an werz (mewsim) hene :  
BIHAR, HAVÎN, PAYÎZ û ZIVISTAN

Her dema salê sê meh dom dike.

**Mehên biharê** : Adar, Nîsan, Gulan

**Mehên havînê** : Hezîran, Tîrmeh, Tebax

**Mehên payîzê** : Îlon, Çirî, Teşrîn

**Mehên zivistanê** : Kanûn, Çile, Sibat

## NAVÊN MEHAN

kurdi	almani	fransizi	ingilizi	tirki
Çile	Januar	Janvier	January	Ocak
Sibat	Februar	Février	February	Şubat
Adar	März	Mars	March	Mart
Nîsan	April	Avril	April	Nisan
Gulan	Mai	Mai	May	Mayıs
Hezîran	Juni	Juin	June	Haziran
Tîrmeh	Juli	Juillet	July	Temmuz
Tebax	August	Août	August	Ağustos
Îlon	September	Septembre	September	Eylül
Çirî	Oktober	Octobre	October	Ekim
Teşrîn	November	Novembre	November	Kasım
Kanûn	Dezember	Décembre	December	Aralık

KURMANCÎ

## ROJÊN HEFTÊ

Gotina **hefte** ji jimara heft tê, bi xwerû kurdî ye.  
Di **hefteyek** de heft roj hene. Va ne navên rast ên van rojan û wergerandina wan a bi zimanên biyanî :

kurdî	almanî	fransizî	îngilizî	tirkî
Yekşem	Sonntag	Dimanche	Sunday	Pazar
Duşem	Montag	Lundi	Monday	Pazartesi
Sêşem	Dienstag	Mardi	Tuesday	Salı
Çarşem	Mittwoch	Mercredi	Wednesday	Çarşamba
Pêncşem	Donnerstag	Jeudi	Thursday	Perşembe
Înî	Freitag	Vendredi	Friday	Cuma
Şemî	Samstag	Samedi	Saturday	Cumartesi

**Her heftiyekê heft roj in  
Hevalan! Werin bijmêrin**

**Roja Yekşemî**

**Roja dûşemî**

**Roja sêşemî**


**Roja Çarşemî**

**Roja pêncşemî**

**Roja Înî û roja şemî**

**Bi Xoşîyê bijîn hemî**

# VAN HEJMARAN YEKO YEKO BIGHÎNIN HEV





## QUNCIKA EDEBIYATA KURDÎ

### TÎRÊJ

Di roja me de, gava navên çend helbestvanên kurda yên bi nav û deng bê gotin, bê gûman ewê navê şairê mezin Tîrêj di nav wan navan de derbas bibe. Lê mixabin heta nuha dîwanên wî bi awakî giştî nehatiye weşandin û nebûye malê gel. Tev vî tiştî jî, gelek helbestên Tîrêj ji alî dengbêjên kurda bûnin sitran û di nav gel de bi zewq li wan tîn guhdarî kirin.

Em pir pê kêfxweşin, ku ewê di nêzîk de dîwana wî ya bi navê "XELAT" bê weşandin. Wê gavê xwendevanên bêtir bikaribin wî helbestvanê mezin binasin. Di vê berheman hêja de, mirovê bikanibe bi riya helbestên mamoste Tîrêj li seranserê Kurdîstanê bighere, bibe mêvanê Sîyamed û Xecê, Mem û zîn, Seydayê nemir Ahmedê Xanê...Dîroka Kurdîstanê bi kurtayî jî be, ewê bibe wek neynike li hemberî mirov. Mirovê li ser gorê şehîdên Kurdîstanê û şairên kurda yên bi nav û deng bigere,

bi evîndarên dil pak û dilşevitî bibe hogir û heval. Bi pêşmerge qahreman re, xwe li ser ciyayên Kurdîstanê bibîne. Mirovê ava wek birûskê ji kaniyên li serê ciyan û qontara geliyên kûr de vexwe, bi bîna gul û çiçekên Kurdîstanê û bi dengê şalûl û bilbila sermest bibe...

Tîrêj, di helbestên xwe de zilm û zordariya li ser kurda, sedemên bindestiya wan û ji bo rizgarîya Kurdîstanê pêwîstiya têkoşînek bi rûmet û canbêzariyek bê sênor jî, bi hunermendiyek mezin aniyê ziman.

Seydayê Tîrêj di sala 1923-yan de li qeza Qamişlo, gundê Nicîmê hatiye dinyê. Navê wî yê rastî Naîf e. Ew kurê Heso ye û ji malbatek hejar e.

Gava ew dibe şeş salî, bavê wî mala xwe bar dike û tîrêj gundê Sêmitikê. Tîrêj li we derê, li cem mele Birahîmê Golî Quranê û çend kitêbên olî dixwîne. Wek gelek Helbestvanên kurda, ew jî di medresa olî de dest bi xwendin û nivîsandinê kirîye.

Di sala 1937-an de hatiye bajarê Amûdê û li wê derê ketiye dibistanê. Bênc sala li wê dibistanê xwendiyê. Lê mixabin ji ber mercên aborî, wî xwendina xwe nikarîbû bidomanda. Têkiliyên wî bi helbestvanê mezin Cigerxwîn,

helbestvan û ronakbirê hêja Qedrî Can û Nuredîn Zaza re xurt bû ye. Bi wan re xebata niştimanperwerî kiriye. Mamoste Tîrêj jî, wek gelek welatperwer û ronakbirên kurd di nav rêxistina "Xoybûn" de cihê xwe girtiye. Li gel nivîsandina helbest û kurte çîrokan, têkoşînek bi rêxistinî û siyasî jî meşandiye.

Mamosta Tîrêj, li gel hinek kurte çîrokan du dîwan jî nivîsandiye. Navê wan "Xelat" û "Zozan" in. Ew nuha li Kurdîstana Başûr dijî û helbestên hêja dinivîsîne. Bi hevîya jiyaneke dirêj û penivîsa wî her tûj be.

Ev çend helbestên li jêr hatiye nivîsandin, ji Dîwana Xelatê hatiye girtin.

**Bavê Hêvî**

## ÇARDEM

Ey Mizgîno bixwîne

Van rêçikên li jorî

Bo tu nezan nemînî

Biçûko dê bi gorî

Hemî sal sêsed û şêst

Di gel şeş roj bi hejmar

şev ji rojan tên hesab

Bi seetan bîst û çar

Ji heft roja ya heştan

Di navbêra wan în e

Sal dibitin donzde meh

Rojê wan sîh yek û sîne

Pêşî kanûna paşîn

Sibat û adar li dû

Nîsan gulan hezîran

Tîrmeh û tebax li dû

Ya nehemîn elûne

Çirya pêşîn dehe

Yazde çirya paşîne

Kanûn li pê dozdehe

Sal hatiye par kirin

çar dem jê hatine der

Her navbera sê mehan

Jêr heye wextek û ger

Bahar qad heşîne

Hahîne dinya germev

Paîzê pel weşîne

Zivistan sar û serma

# MEMO RABE

**Memo zûka rabe  
Sibeye roj va hilat**

**Xew ji tera nabe  
Dem û dewra dersê hat  
Rabe, rabe, rabe  
De rabe xewaro**

**Divê em bixwînin  
Bi zarê xwe Kurmancî  
Doza xwe pêk bînin  
Tevda bighên armancê**

**Rabe, Rabe, Rabe  
De rabe xewaro  
Welatê me pir xweşê  
Dibêjinê Kurdîstan**


**Lezke zû bimeşê  
Da em biçin dibistan  
Rabe, rabe, rabe  
De rabe xewaro**

**Bê xwendin û zanîn  
Nabî tu kar û xebat  
Bê şer û bê ceng û xwîn  
Nabe azad ev welat**

**Rabe, rabe, rabe  
De rabe xewaro**

**Tîrêj**

# RİYA RAST BİBİNİN



**QUNCIKA**  
**BAJARÊN KURDISTANÊ**

**AMED (DIYARBEKIR) - 1 -**


**NAV:**

Navê kevn Amed e. Ev nav li ser şûrekî ku ji 1400 sal berî mîladê de maye, nivîsandiye. Heta bişti mîladê bi 700 salî jî navê bajêr Amed bû.

Erebên misliman di dema Hz. Osman de, li vê derê bi cîh û war bûnin. Li gorî ansîklopediyên tirkî, di wê demê de qebîla Bekir jî ji Erebaştanê koç kiriye û hatiye li Amedê bi cîh û war bûne. Ji ber wê yekê jî navê Amed guherandine û kirine Diyarê Bekir.

Rojnama Diyarbekir bi awakî ber fireh propoganda kir, ku navê bajêr bibe Amedî Diyarbekir û di sala 1869-an de nav bi wî awayî hat qebûl kirin.

Di sala 1937-an de, hukûmeta Tirkî dîsa navê bajêr guherand û kir Diyarbakir.



*Deriyê Ruhayê*



*Deriyê Xarpûtê*



## **DÎROK (TARÎX) :**

**Navçeyên ku Hîtîti nedigihîştinê, di bin destê Hûrrî û Mîtanîyan de bû. Lê dû re, navçeya Amedê kete bindestê Asuriyan, Urartûyan, Îskîtan û paşiyê jî kete bindestê Medan. Amed bû paytextê Împeratoriya Medan.**

**Berî mîladê di sala 550-î de Persî ketin vê navçeyê. Bi dû têkçûna Împeratoriya Persan, herem kete destê Makedonîyan. Dûre jî, navçe kete bindestê Selevkos, Part û Ermenîyan... Berî mîladê di sala 69-an de navçe kete destê Împeratoriya Roma. Dema Împeratoriya Roma bû du perçe, Amed di bin destê Bîzansiya de ma.**

**Piştî mîladê, di sala 639-yan de bajar ji alî Ereban hate girtin. Serleşkerê Ereban Xalid bin welid bû...Dû re, ev herêm kete destê Emeviyan û Abbasiyan. Waliyê Abbasiya emîr Îsa di sala 889-an de serxwebûna xwe îlan kir û serxwebûna wî 30 salan dom kir, Pişt re kete destê Abbasiyan. Di sala 1070-î de, bajar kete destê Selçukîyan.**

**Demekê Tîmûrling ev herêm talan kir. Di 1401-an de Karakoyunî û dû re Akkoyunî bûn serdarê vê herêmê...Di dema şah Îsmaîl de jî, navçe kete bindestê Sefewîyan.**


**Ji sala 1515-an û vir de, Amed di bin nîrê Tir-**

kan de ye. Di dema Osmaniyan de bajar bû bû navendiya vê eyaletê. Di salên 1800-î û pê de, bajar bû bû navendiyek çandî (kulturî).

**CîH:**


Amed li rojavaya Kurdîstanê ye. Li rojhilatê wê Sêrt û Mûş, li başûrê wê Ruha (Urfa) û Mêrdîn, li rojavayê wê Adiyeman û li bakurê wê jî Xarpêt û bîngol heye.

11 qeza bi bajêr ve girêdayî ye. 26 nehye û 663 gundên bajêr û qezayên wê hene.



## Qezayên Amedê ev in:

- 1- Bismil: 88 gundên wê hene.
- 2- Çermîk: 65 gundên wê hene.
- 3- Çinar : 51 gundên we hene.
- 4- Çunguş: 35 gundên wê hene.
- 5- Dicle : 35 gundên wê hene.
- 6- Erganî: 70 gundên wê hene.
- 7- Hênê : 18 gundên wê hene.
- 8- Hezro : 22 gundên wê hene.
- 9- Qulp : 45 gundên wê hene.
- 10-Licê : 55 gunden wê hene.
- 11-Farqîn: 65 gundên wê hene.



## **ERDNÎGARÎYA DIYARBEKIR:**

Derdora vê herêmê bi çîyan hateye rapêçandin. Herem weke kortekê ye û bilindayî ya ji bahrê nêzîkî 700 m. ye. Li bakurê bajêr çiyayê Torosê heye. Li rojavayê bajêr çiyayê Qerejdax (çiyayê Reş) heye. Bilindiya çiyayê Qerejdax 1919 m. ye. Cîhê herî bilind Mêrga Mîr e. Li sînore Amed û Mûşê çiyayê Andûk heye û bilindîya wî 2830 m. e.

Deştên Gewran, Karahan, Amed û Kîkî di warê çandinîyê de, gelek bi nav û deng in.

Çemê herî dirêj û girîng Dicle ye. Bi tevayî dirêjîya wî 1900 km. ye. Çemê Embarê û Batmanê jî tevî çemê Dicle dibin.

## **HEWA:**

Bihar û havîna vê herêmê gelek germ e û gelek hindik baran dibare. Payiz û zivistan jî pir sar e û pir jî berf û baran dibare. Meha herî germ, meha temûzê û ya herî sar jî meha çîle ye.

(Dumahîk heye)

## QUNCIKA MATEMATİKÊ

1) Sê heval diherin cem dikana qesabekî, ku goşt bikin. Qesab ji wan re dibê: "gelî xorta, hew berxekî min ma ye û 24 kîloyan dikşîne. Kîloya wî jî bi 15.50 kronî ye. Hun her yek çend kîloyan dixwazin?"





Mizgîn dibê: "ji sisya yekê wî ji min re". Gurgîn dibê: "ji çara yekê wî ji min re". Bangîn jî dibê: "dawiya mayî ji min re".

Gelo her yekî çend kîlo goşt para wan dikeve û çend kronan dide?

2) Masiyek 15 kîlo ye û kîloya wî bi 7.50 kronî ye. Kîloya porteqala bi 3.25 kr. ye. Gurzê bexdenûsê bi 0.75 kr. ye. Îsotê şîn bi 8.50 û pîvaz bi 3.00 kr. ye.

Gurgîn 3 kîlo masî, 2,5 kîlo porteqal, gurzek bexdenûs, 0,5 kîlo îsot û 2 kîlo pîvaz dikire. Gelo Gurgîn çend kronan dide dukandar?

# XAÇPIRS



1- Zevîkî min heye,  
Toxim nareşînim şîn tê,  
Av nadim dighêje,  
Peretî didrûm, Berê wê kêr nayê.  
Ew çiyê ?

Bersîv: Ser ruyê mêra

2- Qutîka Silêmanî,  
Serê heft rîya danî,  
Pêştirî xwedê kes pê nizanî.  
Ew çiyê ?

Bersîv: *Kulfeta bi halekî*

3-Almast çû mala mîra,  
Pey bû şeqe şeqê tîra.  
Ew çiyê ?

Bersîv: *Gulî*

4-Can bêcanê sîyar bû,  
Can bêcanê tev bêîmanê sîyar bûn.  
Ew çiyê ?

Bersîv: *Merî , gemî , av*

BERSİVA XAÇEPIRSAN (39)



1



2

1

2 →

D E S T

3 →

S E R Ş O K


4 →

D A R I S T A N

Z

5 →

M A S İ




5

D

6 →

M A R

N



3

7 →


P I R T U K



7



4




6



**KEREKÎ ME HEBÛ  
Û KUNDIREKÎ ME  
KERÊ ME  
KUNDIRÊ ME KOT KOT  
  
ME JÎ ÇÎROK  
Û MESELÊN XWE  
YÊN VÊ HEJMARÊ  
JI WE RE GOT**

**Kulîlk**







YAN

# **KURDISTAN**

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 10:- skr  
BIHA